QULIXKIRINA MEYE PADŞATIYÊ

MIJDAR 2015

TÊMA VÊ MEHÊ: "Min daçikand, Apolo avda, lê Xwedê gîhand" (1 Korn. 3:6).

HEFTIYA JI 9 MIJDARÊ

Kilama 52 û Dua

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
lv Serê 2 abz. 12-21, rûp. 24 çargoşe (30 deqe)

Mekteba Dannasînkirinê:

Xwendina Kitêba Pîroz: 1 Dîrok 21-25 (8 deqe)

№ 1: 1 Dîrok 23:1-11 (3 deqe yan hê kêm)

№ 2: Mêr Gerekê Nehêle, wekî Jina Wî Riya Wî di Qulixkirinêda Bigire (*td* 42C) (5 deqe)

№ 3: *my* **Serhatî 115** (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 44

10 deqe: "Min Daçikand, Apolo Avda, lê Xwedê Gîhand". Gotar li ser hîmê têma vê mehê ye (1 Korn. 3:6). Hergê wede dest dide bide xebatê fikirên ji "Birca Qerewiliyê" ya 1 Adarê sala 1993, rûpêlên 20-23 (ru). Kin dîna xwe bide hine parên Civata Qulixiyê ya vê mehê û kifş ke ku çawa ev, têma mehêva girêdayî ne.

20 deqe: "Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Belakirina Kitêbê 'Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?'". Şêwirkirin. Temaşa kin ji du para nîşan ke. Di temaşa pêşinda bide xebatê rêberiya ji vê gotarê, lê temaşa dudada pêşanîna xwe nîşan ke ya ku tu didî xebatê.

Kilama 12 û Dua

Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Belakirina Kitêbê "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?"

Ev Yek Çira Ferz e: Qutiya meye hacetada, haceta sereke ya seva hînkirinê, ev heye pirtûka "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?" Hemikî, pêşiya ku pê vê kitêbê tevî kesekî hînkirinê derbaz kin, em gerekê kitêbê wanara bihêlin. Xêncî wê yekê her kes ji me gerekê bixebite ku bibe cêribandî û bizanibe ku çawa xizmetkirinêda dikare bela ke pirtûka "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?" (Metlk. 22:29). Gelek mêtod hene ku çawa evê kitêbê bela kin, û xizmetkar gerekê mêtodê usa bidine xebatê, yên ku bi dîtina wan baş e.

Çawa Bikin:

- Pirseke usa dayne bi saya kîjanî ku tê bikaribî dîna xweyê malê raste-rast bidî li ser serîkî ji wê kitêbê. Tu usa jî dikarî bijbêrî yek ji wan pirsa, yên ku destpêka her seriyada hene. Paşî wê yekê ça tu caba wî bibihêyî, bixûne rêza layîq û paşê wîra nîşan ke abzasa ku wê têmayêva girêdayî ye. Û dibeke hûnê bikaribin tevayî şêwirkin jî.
- Dîsa mêtodek heye, û tu dikarî bidî xebatê rûpêlên pêşin seva ku hewasa xweyê malê mezin kî. Û paşê dikarî nîşan kî ev cî di kitêbêda, kîderê ku cabên Kitêba Pîroz tê dayînê. Besa xeberê, tu dikarî dîna xwe bidî qeziyakê derheqa kîjanî ku li wan paşwextiya deng-besada digotin, û şiroveke ku geleka berxwe dikevin û dixwazin bistînin caba pirsên ku li ser rûpêla 3 hene. Yan jî tu dikarî bêjî ku têyî cem meriya, seva ku derheqa axirîke baş wanara gilî kî. Paşê nîşan ke şikilên ser rûpêlên 4-5 û pirs ke, "Kîjan ji wan soza hûn dixwazin ku bêne sêrî?" Dîsa dikarî bêjî, ku tu têyî cem meriya seva ku alî wan bikî bivînin cabên li ser pirsên girîng. Paşî wê yekê xweyê malêra nîşan ke pirsên ku jêrê li ser rûpêla 6 hene, û pirs ke hela caba kîjan ji wan pirsa dixwaze bistîne.
- Seva ku destpêkî hînkirina Kitêba Pîroz dikarî pêra-pêra bêjî xweyê malê: "Em meriyara evê edebyetê seva hînbûna Kitêba Pîroz nîşan dikin. We qe eva dîtiye? [Hîviyê be ku caba xwe bide.] Hergê çend deqê we heye, ez dixwazim wera nîşan kim ku çawa hînkirin derbaz dibe".

Evê Yekê vê Mehêda Bide Xebatê:

- Wedê hînbûna Kitêba Pîroz tevî malbetê, xwe hazir ke ku çawa tu evê kitêbê bela kî.
- Çaxê tu xizmet dikî, heval-xizmetkarê xwera gilî ke ku tê çi bêjî xweyê malê (Metlk. 27:17). Hergê pêşanîna te kêrhatî nîne, wê biguhêze.

 © Wachtturm Bibel- und Traktat-Gesellschaft der Zeugen Jehovas, e.V., Selters/Taunus

HEFTIYA JI 16 MIJDARÊ

Kilama 41 û Dua

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
lv Serê 3, abz. 1-7, rûp. 29 çargoşe (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 1 Dîrok 26-29 (8 deqe)
№ 1: 1 Dîrok 29:20-30 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Duayên ku Xwedê Dibihê (*td* 5A) (5 deqe)
№ 3: *my* **Serhatî 116** (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 35
10 deqe: Her Tim Avde Merivên ku Hewasa Xwe Didine Kifşê (1 Korn. 3:6-8). Hilde qisekirinê ji pêşengê hertim û xizmetkar. Ewana ça serlêdanên dubare dikin? Çawa ewana hazir dibin? Çaxê ewana dixebitin ku dîsa meriya malda bivînin, hingê ewana çawa evan çetinaya derbaz dikin? Çi qewimandinên baş cem wana hebûn?
20 deqe: "Aûdîo Nivîsandina, Çawa Bidine Xebatê". Pirs û cab. Şiroveke ku çawa xizmetkar dikarin li ser jw.org, aûdîo nivîsandina bivînin. Ça mesele guhdarara aûdîo nivîsandinekî vêxe. Temaşê hazir ke li gora qewimandinê ku li kutasiya vê gotarêda heye "Malpera Me Qulixkirinêda Bidine Xebatê; 'Cabên ji Kitêba Pîroz' ". Ev gotar ji "Qulixkirina Meye Padşatiyê ye" ya sala 2014.
Kilama 14 û Dua

Aûdîo Nivîsandina, Çawa Bidine Xebatê

[1] Geleka xweş tê bidine xebatê jw.org seva ku gotinên rastiyê ye xweş û rast, *bixûnin* (Waîz 12:10). Lê hûn didine xebatê aûdîo nivîsandina? Bi saya wê yekê em dikarin gelek înformasiyona ku di malpera meda heye, *bixûnin*. Çawa aûdîo nivîsandin dikarin mera kêrhatî bin?

1. Xêncî edebyetên neşirkirî, dîsa çi tiştên kêrhatî cem me hene?

[2] **Bona Hînbûna Şexsî û Hînbûna Malbetê:** Çaxê em derdikevin rêwîtiyê yan şixulê xweye her rojîva mijûl dibin, em dikarin guh bidine aûdîo nivîsandinê yê Kitêba Pîroz, jûrnala, yan edebyetên din. Ev yek dikare alî me bike seva ku wedê xwe hê baş bidine xebatê (Efes. 5:15, 16). Wedê qulixkirina xweye tevî malbetê em dikarin ne ku tenê ji edebyetê neşêrkirî bixûnin, lê usa jî bibihên aûdîo nivîsandinê ya wê têmayê ku em derbaz dibin. Bi vê yekê xizmeta me hewas dibe. Xêncî wê yekê, em dikarin aûdîo nivîsandina wedê hînbûna Kitêba Pîroze şexsî jî bidine xebatê. Ewê alîkariya me bike xût wî çaxî gava em dixwazin xwendina xwe hê baş kin yan çaxê ku ziman hîn dibin.

[3] **Seva Xizmetkirinê:** Merivên mihala me dikarin bêjin ku wedê wan tune edebyeta bixûnin, lê diqewime ewana wê qayîl bin guh bidine aûdîo nivîsandina. Yan diqewime emê rastî wan meriya bên, yên ku li ser zimanê din xeber didin, û yên ku hê hazir in mizgîniya Padşatiyê, li ser zimanê xwe bibihên (Kar. Şand. 2:6-8). Hine kûltûrada ku guh bidî kesekî, ev tişteke ferz e. Mesele, kûltûra Hmongda meriv terîxiya xwe timê bi zar-zimanê xwe, derbazî cahila dikin. Û ew cahil rind bîra xweda xwey dikin elametiya ku ewana dibihên. Xêncî wê yekê, di gelek kûltûra Afrîkayêda jî, meriv lezet distînin çaxê tiştekî pêdihesin derheqa serhatiya ku wanara gilî dikin.

[4] Di mihala weda wê kêrhatî be, hergê kesekîra aûdîo nivîsandinê li ser zimanê wî vêxin? Diqewime ku kesek karê bistîne ji aûdîo edebyetê, ku em bi e-nema wîra dişînin? Em dikarin aûdîo nivîsandinê li ser CD bidine kişandinê, seva ku bidine xweyê malê, û serda jî edebyeta neşirkirî? Her kitêbeke elektronê, broşûr, jûrnal, yan belavok, ya ku em kesekîra wedê xizmetkirinê didin, em dikarin hesabên belakirinêda kifş kin. Aûdîo nivîsandin seva me hatine sazkirinê, ku hînbûna xweye şexsîda em bidine xebatê û usa jî ku bikaribin daçkînin toximên rastiyê ya Padşatiyê (1 Korn. 3:6).

2. Çawa em dikarin bona hînbûna şexsî û hînbûna malbetê, aûdîo nivîsandina bidine xebatê?
3. Kî di mihala meda dikare karê bistîne ji aûdîo nivîsandina?
4. Em çi pirs dikarin bidine xwe, seva ku alîkariyê bidine merivên mihala xwe?

© 2015 Christian Congregation of Jehovah's Witnesses.
Druck und Verlag: Wachtturm, Selters/Ts. Printed in Germany

HEFTIYA JI 23 MIJDARÊ

Kilama 26 û Dua

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
lv Serê 3, abz. 8-15, rûp. 30 çargoşe (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 2 Dîrok 1-5 (8 deqe)
№ 1: 2 Dîrok 3:14-4:6 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Pirxeberî, Duakirin Meriyamêra û yên Pîrozara, bê Kêr in (*td* 5B) (5 deqe)
№ 3: Emirê Meriya Pêşda Nehatiye Nivîsarê (*td* 1A) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 47
10 deqe: "Lazim e Xwe Hazir kin, ku bi Hostatî Hîn kin". Gotar.
10 deqe: Rabûn-Rûniştandina Baş, Mecalê Dide ku Toximê Rastiyê Daçkînin. Şêwirkirin li ser hîmê kitêba "Hersalî", ya sala 2015, rûpêla 49, abzasa 3, heta rûpêla 52 abzasa 1; û rûpêla 140, abzasa 3, heta rûpêla 141, abzasa 3 (ru). Bila guhdar gilî kin ku çi ders ewana ji wê yekê seva xwe hildan.
10 deqe: "Pirtûka 'Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?', Rind Bidine Xebatê". Şêwirkirin. Temaşê kin nîşan ke.
Kilama 42 û Dua

Lazim e Xwe Hazir kin, ku bi Hostatî Hîn kin

Du derecada, pirsek derheqa jîyîna her heyî dane Îsa, lê her car ewî usa cab dida ku hewcên wan hildida hesab (Lûqa 10:25-28; 18:18-20). Dibe ku em rind zanin têma ya seva hînkirina Kitêba Pîroz, lê em yeke gerekê pêşda xwe hazir kin û hewcên şagirtê xwe jî hildin hesab. Çi wîra çetin e fem bike û li ser çi ew dixebite ku qebûl ke? Kîjan ji rêzên kifşkirî em gerekê tevî şagirt bixûnin? Çiqas abzas em gerekê carekêra derbaz bin? Diqewime wê mera lazim bê meselekê hazir kin, tiştekî bi cûrê din şirovekin, yan hine pirsa hazir kin, seva ku alî şagirt bikin fem bike elametiya ku tê dayînê. Em zanin ku Yahowa toximê rastiyê li dilê wan merivada mezin dike. Lema jî wedê hazirbûna me seva hînkirinê, em gerekê Yahowara dua bikin, ku ew qewata me kerem ke, ya ku em didine xebatê seva ku ruhanîda alî şagirta bikin (1 Korn. 3:6; Aqûb 1:5).

Pirtûka "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?", Rind Bidine Xebatê

Çaxê şagirt pêdihese ku Kitêba Pîroz çi hîn dike, û paşê li jîyîna xweda evê zanebûnê dide xebatê, bi wê yekê ew ruhanîda mezin dibe û berêd baş jî tîne (Zeb. 1:1-3). Em dikarin alî şagirtê xwe bikin ku ew pêşda here, hergê rind evê kitêbê bidine xebatê.

Pirsên Pêşxeberê: Her serîk bi pirsa destpêdibe, caba kîjana ku wan seriyada tê dayînê. Tu dikarî pirsên rêtorîk daynî, seva ku hewasa şagirt mezin kî hindava têmayê ku hûnê şêwir kin. Yan jî tu dikarî wîra bêjî ku ew kin caba van pirsa bide. Hergê şagirt rast caba xwe nade, nelazim e wîya rast kin. Cabên wî wê alî te bikin têderxî, hela li ser çi tu hê zêde gerekê dîna xwe bidî (Metlk. 16:23; 18:13).

Elametiya Zêde: Hergê şagirt fem dike û qebûl dike têmayê ku hûn şêwir dikin, tu dikarî wî hêlan kî, ku paşê xwexa bixûne elametiya zêde jî, ya ku dikeve vê seriyê. Lê careke din tu dikarî nava çend deqada hinekî biwekilînî, seva ku îzbat bî wekî şagirt têmê fem dike. Xêncî wê yekê hergê seva şagirt kêrhatî be, tu gerekê wedê hînkirinê şêwir kî fikirên ji elametiya zêde, yan hine parên ji wê elametiyê wîra bixûne. Usa jî tu dikarî wan pirsa bidî wî, çi ku te pêşda hazir kiriye.

Çargoşe bona Wekilandinê: Kutasiya her serîkî heye çargoşe, kîderê ku tê dayînê caba pirsên ku destpêka seriyêda heye. Tu dikarî evan tişta bidî xebatê, seva ku îzbat bî wekî şagirtê te fem dike û dikare şiroveke fikirên sereke. Ewan cabên ji çargoşê bi dengê bilind tevayî bixûnin, usa jî ew rêzên ku li ber wan caba têne dayînê. Paşê şagirtê xwera bêje ku caba xweda bide xebatê rêzekê yan çend rêza, seva ku şiroveke hela çima ew bawer dike ku ev yek rast e (Kar. Şand. 17:2, 3).

HEFTIYA JI 30 MIJDARÊ

Kilama 39 û Dua

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
lv Serê 3, abz. 16-21 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 2 Dîrok 6-9 (8 deqe)
№ 1: 2 Dîrok 6:22-27 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Îsa Emirê Xweyî Merivayî Berva da, Çawa "Kirîn" seva Hemûya (*td* 16A) (5 deqe)
№ 3: Qîmeta, ku Himberî Îsa bû (*td* 16B) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 48
10 deqe: Belakirina Jûrnala di Meha Kanûna Pêşinda. Şêwirkirin. Bi temaşê destpêke û bide xebatê du cûrek ji pêşanîna, yê ku têne dayînê. Paşê ji serî heta xilaziyê evan pêşanîna şêwir ke.
10 deqe: Hewcên Civatê.
10 deqe: Me Ça ev yek Kir? Şêwirkirin. Bila xizmetkar bêjin ku çi kar wana sitand, çaxê didan xebatê fikirên ji gotarê, "Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Belakirina Kitêbê 'Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?'" Bêje guhdara ku qewimandinên baş gilî kin.
Kilama 141 û Dua
Dîna xwe bidinê: Ji kerema xwe miqamê carekê vêxe ku bibihên, û paşê bila civat kilama teze bistirê.

Elametî

■ Edebyetên bona belakirinê seva meha **Mijdar û Qanûna Pêşin**: "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?" yan jî yek ji wan belavoka: "Halê Dinyayê wê Çawa be?", "Çi Lazim e, seva ku Malbet Bextewar be?", "Kî bi Rastiyê li ser Dinyayê Hukum Dike?" yanê "Gelo wê Bê Ew Wede, Çaxê Kul-Derd Îda Tune bin?" **Çile û Sibat:** "Mizgîniya Xwedê seva Meriya" "Riya Edilayê û Bextewariyê", "Guh Bide Xwedê", yan "Guh Bide Xwedê û Bijî Heta-Hetayê".

Cûrek ji Pêşanînê

Birca Qerewiliyê® 1 Kanûna Pêşin
Derheqa Padşatiya Yahowa Elam Dike

"Îro nihêrandina meriya derheqa Kitêba Pîroz cûre cûre ye. Geleka qedirê Kitêba Pîroz digirin, lê ewana difikirin ku çetin e evê kitêbê fem bikin. Hûn derheqa vê yekê çi difikirin? [Hîviyê be bira caba xwe bide.] Dîna xwe bidin ku çi menî seva me heye, seva ku bixwazin Kitêba Pîroz fem bikin. [Bixûne Romayî 15:4.] Ev jûrnal şirovedike wekî ji ku em zanin ku Kitêba Pîroz bona hînbûna me hate nivîsandinê. Û usa jî ev jûrnal alîkarî dide me seva ku hê rind fem bikin Kitêba Pîroz".

Hişyar Bin!® Kanûna Pêşin

"Îro em derheqa problêmên malbetê xeber didin. Her kes hizreta wê yekê ye ku di malbetêda edilayî û yektî hebe. Ça hûn difikirin çi hê baş e, ji problêmên malbetê birevin, yan jî hîn bin ku çawa dikarin evan problêma tevayî safî kin? [Hîviyê be bira caba xwe bide.] Dîna xwe bidin Kitêba Pîroz çi dibêje. [Bixûne Metelok 26:20.] Di vê jûrnalêda hine şîretên kêrhatî ji Kitêba Pîroz hene, seva ku alîkariyê bidine malbeta, ku bikaribin edilayê di mala xweda xwey kin".

Pêşdaçûyîn di Qulixkirinêda

Di Gurcistanêda 17-19 Tîrmehê civata mezin ser zimanê Kurdî-Kurmancî derbaz bû. Lape zef 256 meriv hatibûn, û 5 meriv hatine nixumandinê! Em şa dibin ku divînin xûşk-birên me tevayî top dibin wekî pêbihesin ku çawa çev bidine Îsa (Romayî 15:7-9).

km15 11-RDU Ga
150805